# Diyardeya "zarokên kolanan" li Kurdistanê

Dr. Ebdulbaqî Mayî

*E-mail: Abdulbaghi.Ahmad@bupinst.uu.se*

"Zarokên cadda" diyardeyeka komelayetî ya nebaş e û gelek zererê li hest, reftar û kesayetiya zarokî tûşbûyî dike. Ev diyarde ji mêjeye li cîhana siyê ya hatî diyarkirin. Eger, mîkanîzm û encamên vê gelek ji mêje di nav behs û xeberên cîhanî de belav bûne. Pênasîn û xesletên vê çak di dam û dezgehên navneteweyî de xuya û aşkera bûne. Li gelek welatên paşkeftî yên Efriqa, Asya jêrî û Emrîka latînî "zarokên kolanan" ji arîşe û astengên mezin dihên hîsabkirin. Zana û pisporên van welatan xebateka yekcar dûr û dirêj, di xizmeta van cur û terzên zarokan de, encam daye û serhat û lêkolînên zanistî yên wan pisporan, niha ji bo me xelkê Kurdistanê, mîna serkaniyeka zelal û zengîn, pêdivî li serawestanêye ku em mifayê jê werbigirîn û vê diyarda nebaş hêşta di pêçkê de, em nas bikin û di welatê xwe de zû çareserên karîger û pêdivî bo bikin.

Bo cara yekê li Kurdistanê ev diyarde sala 1994-ê, li bajêrê Silêmaniyê hate diyarkirin. Piştî reva mezin ya sala 1991-ê, rêkxirawa UNICEF, raportek li ser rewşa zarokan li Kurdistana Îraqê belav kir û tê da diyar kir ku 24 zarok li nav bajêrê Silêmaniyê piraniya wextê xwe, li ser cadda diborand. Piştî hîngê, rêkxirawa Diyakonya ya swîdî bingehê "Zêwe" wek yekemîn xaniyê komkirina van zarokan li bajêrê Duhokê, sala 1998-ê vekir. Ji adara sala 2004-ê heta gulana 2005-ê, 100 zarok yên temenê wan di navbera 8-16 salî hatin komkirin. Çavpêkeftinên zanistî li gel hatin kirin. Ev lêkolîne, wek têza masterê li pişka saxlemiya derûnî ya kolîja nojdarî ya zankoya Duhokê, sala 2006 hat pesendkirin. Vê lêkolînê diyar kir ku diyardeya zarokên kolanan li bajêrê Duhokê, nîşana belingaziya xêzanêye û piraniya zarokên li ser kolanan, zarokên karker in.